

Piştî “Corona”yê şikefta
Seholan li Mehabadê zêdetir
hatiye piştguhxiştin

»»» R:7



Sernixûniya dîktator
nêzîk bûye

»»» R:4



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (401) 07-07-2021 Buha (1000) Tûmen

Kolberî di encama
bindestiyê de

»»» R:5



Danûstandinên sar û
sist ti nanî napêjin

»»» R:8



JIN Ê XEBAT

Asta beşdariya jinan di karûbarê siyasî û civakî de
nîşaneyê pêşkevîna civatgehê ye

Dr. Ebdullrehman Qasimlo



Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Çend dehikik e ku di Kurdiştanê de jî behsa vê yekê tê kirin ku jin wek mêran mafê wan heye û divê bi yeksanî çav ji jin û mêr bê kirin. Herî kêr di serdema Komara Kurdiştanê û bi hewla jîrane ya Pêşewayê nemir, behsa jin û mafên wê û beşdarîkirin ji jiyana siyasî û biryardan bo civatgehê hatiye nav mijara siyasî ya Kurdiştanê.

Ev behse di asta cîhanî de jî, gelek demdirêj û çend sedeyî nîne û zêdetir di dawîya sedeya nozde û destpêka sedeya bîstem de hebûye ku wek gotar û dîskors bas ji mafê yeksaniya jin û mêran hate kirin û di wêjeya siyasî de hêdî hêdî cihê xwe girt. Helbet em vê yekê jî bi başî dizanin ku di navbera gotin û dîskorsê heta kiryar û edeta civatgehê û siyasî de renga bi qasî deriyayeke pan û berfireh mewda hebe û gelek caran jî, dehan sal derbas dibe ku gotinek di kiryar de reng nade.

Jin demekê dikare ji tev mafê siyasî û civakiyên xwe wekî mêr bi wekhevî behremend be ku bixwe bi kiryar di cergê têkoşîn bo xebata mirovî û azadîxwazane beşdar be; bi vî awayî bi kiryar ev yeka di nav bernamên wê yên karî de têne guncandin ku bi çavekî wekhevî mîzêyê jin û mêr bê kirin û encama behreya wan wekhev be.

Di xebata netewiya Kurdiştanê de jin kêr û zêde di refên şoreşê de beşdar bûne û jin û keçên Kurd di diwartirîn rewş de li pelên pêşmerge û li hêzên pêşmerge Kurdiştanê de digel mêran pêngav avêtine. Eva mînakek çend dehikî ye û heta di refên pêşmergeyê

Şoreşa Jinan



de jî jinên Kurd di refa cangorî de kêr neanîne û di nav çepera berevanî ji kirameta netewî de şehîd bûne. Lê eva beşdarî û amadebûneke wekhevî digel mêran nebûye û em dikarin bêjin eva zêdetir wekî mînakekî bû heta wek hereket.

Lê Rasana Rojhilatê ev mînake di nav refa xebatê de kir bi hereket û yek ji girîngtirîn binyata Rasana Rojhilatê ku kêmtir bas li ser hatiye kirin û dîtin eva ye, ku keç û jinên Kurd li Rojhilatê Kurdiştanê li ser derbas dibin û roj bi rojê rêjeya beşdariya keçan di şoreşê de zêde û zêdetir dibe. Çi di pêngavên jîrane yên bajar de ku jinan refên pêşve pir kirine û çi li refên şoreşê di çiya de; êdî ev jin in ku alayê hildigrin.

Di pêngaveke dîrokî de, jin û keçên Kurd, dewreya 250 a pêşmergeyê li Hêza Pêşmerge Kurdiştanê bo xwe terxan kirin, tev beşdarbûyên dewreyê ji keç û jinên Kurdiştanê ne. Eva ev derfeta şoreşa mezin e ku Rasana Rojhilatê bo jinan afirandiye, ev di piraktîkê de digel mêran wekheviya xwe dane selimandin û pêdagiriyê li ser vê yekê dikin ku mafê tê sitandin û nayê bexşin. Rasana we pîroz be jinên şoreşvan.

Dewreya 250 a destpêkî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê bi rê ve çû

Roja Sêşemî rêkevta 15`ê Pûşpera 1400`an a Rojî, di rêûresmekê de di bin navê “Dewreya Taybet”, dewreya destpêkî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê dawî pê hat.

Destpêka rêûresmê bi sana leşkerî ya Hêza Pêşmerge bo bixêrhatina endamên rêberiya PDKÎ di beşa siyasî û nîzamî de destpê kir.

Paşê rêûresm bi sirûda netewî ya “Ey Reqîb” destpê kir û piştî xulek bêdengî bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê sekînan.

Piştî sunda nîştimanî ji aliyê Hêza Pêşmerge Kurdistanê ve hate xwendin. Rêûresim bi çend şeweyan ji nimayîşa rêjeya keçên Hêza Pêşmerge Kurdistanê bi rê ve çû. Beşa duyem a rêûresmê di salona kombûna PDKÎ de bi rê ve çû.

Piştî “Berpîrsê Dezgeha Fermandehî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê “Kawe



Behramî”, bi hilkefta bi dawîhatina dwereya destpêkî ya 250 a pêşmerge çend gotinek pêşkêş kir.

Navbirî behseke kurt li ser dabûnerîta rêûresmên taybetî yê her 50 dewre û yekemîn dewreya keçan di dîroka Hizba Demokrat de, rola jinan di tevgera siyasiya navxwe û derveyê Kurdistanê de kir.

“Kawe Behramî” di gotinê xwe de behsa mamosteyên şehîd “Selam Ezîzî, Serwan Çeko, Elî Emînî, Xefûr Nebîzade, Serkewt Samedî, Muxtar Qadîrpûr û Faroq Hesênxeyat” kir.

Piştî peyama Fêrgeha Hêza Pêşmerge Kurdistanê ku kurte-behsek li ser dîroka avabûna Fêrgeha Siyasî-nîzamî ya PDKÎ bû, ji aliyê “Muxtar Sohrabî” Berpîrsê Fêrgeha Hizba De-

mokrat ve hate pêşkêşkirin.

Rapora birêveberiya dewreya 250 a destpêkî ya pêşmerge ji aliyê “Ubeyd Muradî” mamosteyê Fêrgehê ve hate pêşkêşkirin.

Peyama dewreya destpêkî ya pêşmerge jî, ji aliyê “Sîma Şerîfî” beşdarbûya dewrê ve hate xwendin.

Di berdewamiya wê rêûresmê de beşek ji van mamosteyên ku waneyên siyasî di fêrgehê de gotibûn ji aliyê “Hesen Şerefî” Berpîrsê Navenda Siyasî ya PDKÎ ve lewhên rêzlênan pêşkêşê van hate kirin.

Beşek ji van mamosteyên ku waneyên nîzamî di fêrgehê de gotibûn ji aliyê “Elborz Rûînten” Endamê Navenda Siyasî ya PDKÎ ve lewhên rêzlênan pêşkêşê van hate kirin.

Di beşa dawîya rêûresmê de ew kesên ku di dewreyê de di beşa siyasî-nîzamî û nezim û disîpîlîn de serkevtin bi dest ve anîbûn hatine xelatkirin.

Yazdehemîn dewreya siyasî ya aştî du beşa yek ya Dezgeha Perwerde û Lêkolînê bi dawî hat

Yazdehemîn dewreya siyasî ya aştî 2ê beşa 1ê ya taybet bi pêşmerge di rêkevta 4ê Cozerdana sala 1400a Rojî de dest pêkir û li rêkevta 9ê Pûşperê ya sala 1400an de bi dawî hat.

Pêka bernameyeke dariştî û qonaxbendîkirî, Dezgeha Perwerde û Lêkolînê, Yazdehemîn dewreya siyasî bo pêşmergeyan bi rê ve bir, di wê dewreyê de ew waneyane hatine pêşkêşkirin:

Rênûsa zimanê Kurdî, Rohnkirina bername û peyrewa navxweyê PDKÎ, dîroka PDKÎ, Federalîzm, Demokrasî, Rêtorîk, Armanca paşeroja PDKÎ, Pîrsa vekheviya jin û mêr, Binyat û siyasîetên Komara Îslamîya Îranê,



karên Rêkxiravî yê bi kom, Siyaset û helwîstên PDKÎ, Ewlehî, Torên civakî û hizira rexnerane” bûn ku beşek ji wan waneyan bi şewaza konferans û bo beşa din re ceribandîna hatine kirin.

Di wê dewreyê de wan beşdarbûyan pileya 1ê heta 3ê bi dest xwe ve anî.

Pileya 1ê: Sîmîn Rohanîzade

Pileya 1ê: Seîd Zari`î

Pileya 2ê: Manîşt Heyderî

Pileya 3ê: Emîr Peymanî

Pîrsa perwerde û hînkari û amadebûna kadir û pêşmergeyên PDKÎ di hemû waran de, yek ji bernameyên PDKÎ ye.

Piştî Kongireya 16ê, PDKÎ hewleke zêdetir bona karê perwerdê dide û dewreyên aştî 2 a beşa 1ê bi şewaza bernameyekî seraşt û dariştî bi rê ve diçin û qonax bi qonax him aştî dewreyan diguhere û him pêşmerge aştî bi aştî wan dewreyan derbas dîkin.

Sernixûniya dîktator nêzîk bûye



N: Nûredîn Sofizade

Rejîma Îslamî ya Îranê ku di wan 43 salên derbasbûyî de ji bona man û paraştina xwe hemî rêyek ceribandî ye, weke rêya xwe sebandina bi gef û deştê zorê, êrîş û girtin û çavtirsandin, kuştin û tepeserî, xapandina xelkê bi bizivandina seha Olî, pîrozî dana bi deshilatê, heta qasekê ku rêberê rejîmê bi nûnerê Xwedê li ser erdê tête zanîn. Direwîn û navikbetaliya hemî wan rêkar û pîlanane êdî ji bo xelkê welat û hemî kesê re eyan bûye.

Êdî ti rewayî û hitbar û pêgehekî wê rejîmê di nava xelkê de nemaye û êdî niha wisa lê hatiye ku parekî zaf a deshilatdar û wan kesên ku xwe xwediyê rejîmê dizanîn jî piştî xwe danê û xwe jê veqetandine.

Dûrkevîtin û bi dijî rawestîyana pareke berçav ji deshilatdarên heya duhûnê yên rejîmê, renga zaf kes wisa jê tê bigihin ku ewane kesên xemxwarê xelkê ne û dilê wan bo azadî û jiyanê xweş a xelkê lêdide û dijberî rejîmê ne, lê ya rastî be wisa nine û ewane ev para ji deshilatê ne ku heya îro jî rêyekê û pîlanekê digerin ku çawan bikarin parek ji xelkê pê bixapînin û bo çend rojekî dinê temenê xwe û rejîma xwe dirêj bikin.

Ew morên îro rojê ku cehdê dîkin bi awayekî dinê xelkê bixapînin, hemen ev kesane nene ku bi dirêjiya deshilata sitemkar a wê rejîmê, deshilata herî bilind hebûne û şîrîkê curm û cinayetên 43 salên derbasbûyî bûne. Ma Mehmûd Ehmedînîjad ew pasdar û xwînmije nine ku deştê wî heya enîşkê bi xwîna xelkê Îranê û bi taybetî gelê Kurd sor bûye û dawî

pošta wî ya deshilatê jî bo heyamê 8 salan Serkomarê rejîmê bû?

Ma Larîcanî û hemî malbata xwe li deshilata herî serwe ya rejîmê de nebûn?

Ma Kerûbî û Mûsewî û Xatemî di nava wê deshilatê de kesên yekem û duyem nebûne?

Ma Refsencanî û malbata xwe her ji deştê pêkê ve deshilata herî bê sînor çine bûn ku îro kur û keça wî rûndikan bo xelkê rojreş ên Îranê dibarînin?

Ku wisa ye hemî ev kesane tawanbar û cinayetkar û şerîkê curmê wê rejîmê ne û divê xelkê welatê me bi vir û direwên wan neyête xapandin.

Parek ji deshilatdarên rejîmê di dehka 2ê ya deshilata wê rejîmê de dema ku seh bi nemana rewayiya rejîmê kirin û dema hêdî hêdî dengê nerizayetiya xelkê ber guhê wan kevt, bi armanca xapandina xelkê senaryoyek bi navê rêformxwazî leyîştin ku mixabin karî bo heyamê 2 dehkan kum bidine serê pareke berçav ji xelkê Îranê û heta dunyaya derve jî û bi vî awayî karî bo heyamekî zaf temenê reş û dîktatoriya Îslamî dirêj bikin.

Di wan 2 salên wê dawiyê de dema ku haylê bûn xelkê hişyar bûye û bal wan tu cudahiyek di navbera deshilatdarên rejîmê de tunîne û xelk bi dijî tevahiyeta rejîmê dirûşman didin û basê sernixûniyê dîkin, lewma rejîmê dukan û bazara xwe ya bi navê rêformxwazî dayêxişt û Elî Xamineyî bona yêkdeştîkirina deshilata xwe, kesên herî nêzîk û bê rehm û cinayetkar danane ser kar.

Ewên ku îro kevtine xapandina xelkê û rûndikên direwîn dibarînin, armanca wan ya sereke ku wisa didine xuya ku dijberê deshilata Xamineyî ne, ewane ne. Leyîştina senaryoyek dinê bi armanca xapandina xelkê



ku bikarin hevşeweyê rêformxwazan bo heyameke din temenê rejîmê dirêj bikin û mixabin bi hegera nebûna opozîsyoneke xwedî bandor bo alternatîva rejîmê, pîlan ew e ku xelk ji bê hêvitiyê û bi sedema nerizayetiyan xwe, piştî bi wan kesan ve girê din û di cihê cehdkirin bo sernixûniya rejîmê, cehdê bikin ku wan morên rejîmê bînine ser kar.

Sedemeke dinê ya şer û qisekirina bi dijî para dinê ya deshilatdaran ev e ku, ev cure kesane bi dirêjiya deshilata wê rejîmê deshilatdarên herî serwe bûne parêzerê bê wirade û wêdeye wê rejîmê ne û xwe heqdar dizanin ku hertim li deshilatê de bin, ku wisa ye şerê wan şerê deshilata wan e û tenê li ber vê ku di deshilata xwe ya yekem de nemane û ji dizîn û talana serweta xelkê deştê wan hatiye dûrxistin, nerehet in ku bêpar dimînin ji miştina zêdetir a xwîna xelkê Îranê, hekî ne xema wan rojreşiya xelkê nine û hekî niha hemî xelkê Îranê bi deştê wê rejîmê bête kuştin, kilmate devê wan binav neyarên Xamineyî dernakeve.

Mesela dinê û ya herî dawiyê ku dîsan her senaryo ye, ev e ku bi rastî ewane ew para ji deshilatdarên rejîmê ne ku gelek baş dizanin rejîmê deve devê sernixûniyê de ye û wan jî ku di çî cinayetekê bi dijî xelkê welat deşt neparastine, ji tirsê xwe ve û bi armanca ewê ku belkî bikarin cinayetkarbûna xwe ji bîra xelkê bibin û belkî di Îrana piştî rejîma axûndî de cihek bo wan jî hebe û nekevîne ber cezaya cinayetên xwe û ber dadigea gel,

lewma wan filman dileyîzin û wisa didine kivşê ku rêza xwe ji ya rejîmê û Xamineyî û Reîsî cuda kirine û digel xelkê de ne. Lê xelkê Îranê û bi taybetî netewên bê maf ên Îranê dibe rûyê rastîn ên wan pîlanên wan bizanin û bixwînin û ti cudahiyê di navbera deshilatdarên duhûnê û îroye wê rejîmê de tunîne û serê hemiyar di mencelekê de ye.

Kolberî di encama bindestiyê de



N: Elî Munezemî

Eger em mêzeyê qonaxên pêşveçûna civakê bikin û civaka Kurdistanê li gor wan pîvanên ku zanişta marksîstî destnîşan kirinî hilsengînin, derdikeve ku dijminan ji rêya girtine pêş a siyaseta dijminkarane û astengkirina geşeya civaka Kurdistanê, nehêlan ku ew civak bi awayeke xwezayî ji serdema derebegayetiye ve derbasî qonaxa sermayedariyê bibe û sermayedarî û proletariyaya pişeyî ji dayîk bibe. Jiber ku pêkhatin û pêşkevîna sermayedariyê dibû sedemê têkdana peywendiyên civakî yên qonaxa derebegayetiye û vê yekê dê pêşveçûna hizra neteweperweriyê û damezrandina dewleta serbixwe ya Kurdî dê pey xwe bianiya. Kurdan li hember wê siyaseta dijminkarane ya neyarên xwe cehd kir ku sermayedariya bazirganî di Kurdistanê de bê rojevê.

Dijmin ji aliyekê ve li hember wê sermayedariya bazirganî jî bê pîlan nesekiniye. Jiber ku neteweya fermanrewa hemû cemserên hêza di destê xwe de ragirtine, odeyên bazirganî û siyasatên wê bixwe diyarî dike û imtiyazên wê yekê dide endamên neteweya serdest. Ji hêla din ve jî xêncî damezrandina hindêk binkeyên pişeyî ku di esas de bo talana dewlemendiya sererd û binerd a li Kurdistanê ye û kêmtirîn xebatkarê wê jî Kurd in, bûye sedem ku hêzek zêde ya merivî di Kurdistanê de bêkar bimîne û bo peydakirina pariyek nan, xwe biavêje helaketê.

Yanî eger em baş bera xwe bidin meselê, hem sermayedariya bazirganiya Kurd û hem proletariyaya Kurd ku li xizmet wê sermayedariyê



de dixebite, herdu alî jî di bin zilma dijminên Kurd de ne û dijmin ji aliyekê nahêle sermayedariya niştimanî li Kurdistanê cihê pê xwe qahîm ke û ji aliyê din jî hem pêşiya pêkhatin û xurtbûna proletariyaya pişeyî û pispora Kurd digre û ji aliyek din ve jî proletariyaya bazirganî dêxe rewşek wisa ku bo aliyê mirinê ve here.

Hemû çîn û aliyên civaka Kurdistanê bi hev re girêdayîne û dagîrker bo tuneke-trina hemûyan bi yek şeweyê dixebite. Em dibînin ku her çî zêdetir dijminan paşekişe bi şoreşa azadîxwaziya gelê Kurd kiribe, hind zêdetir astengî li ser rêya sermayedariya bazirganiya Kurdan û ew kesên ku wek karker di wê sektorê de dixebitin, pêka niye. Caran eger karkerên wê sektorê bi hesp û hêstiran alavên bazirganî li ser tixûbên qelp re derbas dikirin, îro rojê li ber lawazbûna xebata çekdarî ya Kurdan û xurtbûna dagîrkariyê, dijmin kariye bi mînrêjîkirin û damezrandina binkeyên leşkerî li ser sînor, hatûcûn û derbaskirina alavan zêdetir û zêdetir berbest bike û her rojê çendîn kes ji kolberan bikuje.

Em dibe li ser wê rewşê bifikirin û jixwe bipirsin ku gelo çima dijmin bi wê şeweyê reftar dike û bi wan astengiyên li ser rêya kolber

û bazirganên Kurd pêk tînin, li pey çî armancekê ne? Erkê partiyên siyasî û şoreşger li hember wan kiryarên dijmin çî ye û bi çî şeweyekê em dikarin rewşê li berjewendî û qazanca bazirgan û qata proletariyaya Kurd biguherin û vê guhertinê dê bi nobeya xwe çî kartêkeriyek li ser şoreşê hebe? Dijminên Kurd bi hebûna îmkanatên madî û merivî zaf li ser hemû aliyên civaka me lêkolînan dike, pilanan dadirêje û wan pilanan di pratîk de li dijî neteweya me cî bi cî dike. Lê em çî dikin gelo?

Em jî wek xebatkarê gelê xwe li hember wê rewşê berpirsiyar in û dibe em jî li berjewendiya gel û welatê xwe de bi bername û yekgirtî bixebitin. Em dibe rêya wê yekê peyda bikin ku ka emê çawa wê rewşê tev bigerînin û emê çawa rêberiya berxwedana wî gelî di hember neyaran de bikin. Em dizanin ku xebata me ya azadîxwazî hêza xwe li çîna cotyar û proletariya werdigre û burjiwaziya niştimanî jî li gor derfet û îmkanên xwe di wê xebatê de pişikdar e. Ew xebata me dibe wek caran rêbaza bihêz ya şoreşvanî bigre pêşiya xwe û hem çîna proletariya ku xwe li şiklê kolberiyê de derdixe biparêze û hem sermayedariya niştimanî ku wek bazirgan dixebite.

Dijmin armanca wê ev e ku çî rêyekê bo Kurdan nehêle ku bikaribin di warê aborî de ser piyê xwe bisekinin. Hindî aboriya Kurdan lawaz be, civaka Kurdî dê pare bimîne û ew pareman jî dê bibe sedem ku hemû faktorên netewesaziya Kurd paşve bimînin û dijmin jî bi hêsanî bikare wan faktoran têk bide. Eger aborî xurt be, damezrandina dewlet-netewe jî hêsan dibe.

Dijmin hemû rêyên peywendiya navbera bajarên Kurdî bi hev re û poarçeyên Kurdistanê bi hev re dadixîne ku em wek Kurd nekarin bibin xwediyê aboriya hevpar, zimanê hevpar, axa hevpar û li tevî hev bîhanî bibin. Kolberî govannameya wê dagîrkariya dijmin e. Lê hêdî hêdî wisa pêşiya wê jî asteng dikin ku Kurd li Kurd-bûna xwe dest hilbigre. Gava Kurdbûn nemîne, armanca rizgariya Kurd û Kurdistanê jî namîne. Erkê me ye ku em rêyekê bo paşekişe bi wan siyasatên dijmin peyda bikin ku pêngav bi pêngav herine pêş û nehêlin kolber bîn kuştin, hêdî hêdî rewşekê pêk bînin ku wek caran kolberî nemîne û rewşa karkerên wê sektorê baştir bibe û heta ku em bikarin welatê xwe rizgar bikin û nehêlin kedmijî li merivan bimîne û civaka xwe û welatê xwe ji kolonyalîzmê paqij bikin.

Gelo guhertina nû, bizava Talibanê dike DAIŞA Îranî?



N: Serbest Urmiye

Di çend rojên borî de û hevdem tevî vekîşiyana hêzên navneteweyî li Efxaniştanê, “Zabiullah Mujahid”, Berdevkê Bizava ”Taliban” a Efxaniştanê ragihand, ku bizava wan di terzekî nû de êrîşên xwe bo dagîrkirina Efxaniştanê û damezîrandina hikûmeteke nû ya Îslamî di wî welatî de destpê kirine. Berdevkê bizava han neveşart ku di piştê êrîşên wan de destê rejîma Îranê û Rûsiyayê jî heye. Wî anî ziman ku di pêxema damezirandina hikûmeta xwe ya nû de, berê bi her du dewletên Îran û Rûsiyayê re gotûbêj kirine û lihevhatinek di navbera wan her sê aliyên gotûbêjê de heye. Ya balkeş di vê qadê de rejîma Îranê ye ku derbasbûyeke hinde paqij tevî bizava ”Taliban” re cinîne.

Îran û bizava ”Taliban” a berê

Ya ku heya niha di navbera bizava “Taliban” û rejîma Îranê de hebû, dijmindarî û kuştin bû. Sala 1998’an a Zayînî bû ku bi sedan kes çekdarên Talibanê bi destê eniya hevgirtî li dijî Talibanê di herîma “Mezar Şerîf” de hatin kuştin. Eniya hevgirtî li dijî Talibanê an ku hêzên hevalbendiya Bakur, yek ji wan taqimên çekdar bû ku ji aliyê rejîma Îranê ve dihatin piştevanîkirin. Di hember de jî, çekdarên bizava Taliban di pêxema tolhildana kuştîyên xwe de hejmareke pitir ji hezar kesan ji nifûsa herêma Mezar Şerîf kuştin. Di heman demê de 11 kes jî, ji welatî an ku dîplomatên Îranê jî di heman herêmê de hatin kuştin û Talibanê ava çemê “Hîrmend”ê li ser Îranê de qut kir ku bû sedema hişikbûna gola ”Hamûn” di



herêma Sûstan û Belûçîstan a Îranê de.

Sala 2002’an a Zayînî û dema êrîşa Emerîkayê li dijî Talibanê li Efxaniştanê, rejîma Îranê alîkariyên leşkerî û zaniyariyê bi hêzên Emerîkayê re hebûn û di meha Oktobera 2003’an de jî ku li Almaniyayê û ji bo nûnejkirina Efxaniştanê hatibû lidarxiştin, dîsan rejîma Îranê roleke çalak û berçav hebû.

Rejîma Îranê û Talibana nû Hizra Taliban a nû demekê derdikeve ku di ragihandinên fermî yên Îranê de tê gotin ku bizava nû ya Taliban ne ew bizava berê ye û parek e ji paşeroj û fakterek e di çareseriyên pirsgrîkên Efxaniştanê de.

Di heman demê de Zabiullah Mujahid, Berdevkê Bizava

Taliban a Efxaniştanê ragihand, ku nebûna tecrûbeyan û şerên navxweyî rê nedan ku Taliban di heyamê desthilatdariya di Efxaniştanê de, tîkiliyên bivec bi rejîma Îranê re hebin. Li gor gotinên wî, bizava wan guhertin di nihêrînên xwe yên derheq Îranê de çekirine û niha tîkiliyên her du aliyan ne weke yên sala 2000’an in.

Helbet dewleta Efxaniştanê hertim rejîma Îranê tawanbar kiriye ku piştevanîyê ji bizava Taliban dike û hewil dide ku ji bizava han weke aleva zextê di danûsitandinên siyasî_aborî de mifahê wergire. Ev îdiaya dewleta Efxaniştanê di demekê de tê kirin ku rejîma Îranê di lihevhatina xwe ya ticaret û bazirganiyê tevî dewleta Hindûstanê re, Hindûstan alxahîn kiriye ku dê bikare rêyeke ewle bo hinardeyeya



ticareta Hindûstanê bo Efxaniştanê, dabîn bike.

Tê gotin ku guhertina nû di siyasîyên Îranê derheq Talibanê de wediger sala 2015’an û serlildana DAIŞê li Efxaniştanê. Tîkiliyên rejîma Îranê bi Talibana sala 2016’an piştî kuştina Mela Mensûr Exter, serokê taqima han ji aliyê balafirên bê pîlot ên Emerîkayê ve li ser sînorên Pakîstanê, eşkere bûn. Tê gotin ku wê demê Mela Mensûr Exter ji Îranê ve wedigeriya. Piştî sala 2018’an rejîma Îranê da eşkerekirin ku bi haydariya berpirsiyarên Efxaniştanê, bi bizava Taliban re derheq çareseriyê pirsgrîkan di Efxaniştanê de gotubêj kirine.

Îran çi dişopîne?

Di vê dawiyê de tîkiliyên di navbera Îran û Talibanê de heya diçe, berfirehtir dibin û nêrînên her du aliyan li dor hev erênîtir dibin. Bi terzekê ku di heyamê salekê de du caran berpirsiyarên payebilind ên Talibanê bi merema gotûbêjan derbasî Îranê bûne.

Pisporên siyasî, rêyên cur bi cur dişopînin ku rejîma Îranê li hember Emerîkayê derkeve. Bi baweriya wan yek ji wan rêyan, mifah vergirtin e ji taqimên çekdar ên herêmê di şereke bi wekalet de. Di vir de ye jî ku tirs di dilê gel û rayedarên Efxaniştanê de tê dîtin ku siberojê welatê wan bibe meydana agirê şer di navbera Îran û Emerîkayê de.

Îran di mile siyasî û ewlehiyê de vê yekê şirove dike û dide ber rûyê xwe ku di welateke cîran de ku çend bingeheên leşkerî yên dijminên wan hene, destê alîkariyê bo wê neyarên dijminê han weke. Çima ku bi baweriya wan dijminê dijmin, doşt e. Di vir de ye ku baweriya vê çendê li cem pisporên siyasî û leşkerî bihêz dibe ku Îran Talibanê weke hêza şer di cihê xwe de li Efxaniştanê û li dijî Emerîkayê mifahê werbigire.

Nerîna Lîderan



“Rafael Grossi”:

“Îran bi meyandina %20 a Uranîyomê ji rêkvevtina sala 2015an dûr kevtiye”.



“Benny Gantz”:

“Îran baş dizane ku em di nav axa wê de operasyonan dikin”.



“El-kazimî”:

“Me ji Îran û Amerîkayê daxwaz kiriye ku di nav axa Îraqê de şer nekin”.



“Îshaq Cehangîrî”:

“Me dê heta destpêka meha Gelawêjê qutbûna berqê her hebe”.

Piştî “Corona”yê şikefta Seholan li Mehabadê zêdetir hatiye piştguhxiştin



N: Eskender Ceiferî

Şikefta Seholanê dikeve 35 kîlometriya riya di navbera Mehabad-Bokanê de.

Mixabin di salên derbasbûyî de rejîma faşîstên Tehranê wek pêwîst guh nedaye vê şikeftê. Di du salên dawiyê de jî piştî hatina Corona, ev şikeft ji lîsta cihên torîstî yên Îranê hatiye derxistin.

Her hemû torîst û serdanker jî, eger bi dehan caran serdana Seholanê bikin dîsa jî têr nabin. Matmayî dibin û li derdoran dinêrin. Her sal hezaran kes serdana wê şikeftê dikin.

Seholan bi Soranî tê wateya bûzê. Dîwarên wê tev ji kevîrên mîna bûzê ne.

Erdê şikefta Seholan ji gelek kaniyên biçûk û mezin pêk hatiye. Dalan û riyên biçûk û mezin jî di dîwarên şikeftê de hene ku ger bi belemê bikarî derbas bibî yan jî bi avjeniyê, hemû digêjine hev. Kaniya herî dawiyê, bi qasî 50 metran serê xwe daye bin banê şikeftê. Kûrahiya avê di kaniya navîn de digihêje 35 metran. 46 salan beriya niha şandeyeke zanîngeha Akşfordê serdana Seholanê kir û ragihandî ku ew şikeft, ji bêmînaktirîn şikeftên cihanê ye. Wan di raorekê de di vê derbarê de matmayîna xwe anîbûn ziman. Sala 1990’an jî hejmareke lokîneran ji bo naskirina zêdetir, serdana Sehola Mehabadê kirin. Wan karî derî û riyên nû di nav şikeftê de bibînim. Vedîtina wan rîyan jî bû sedem ku zêdetir girîngî bi Seholanê bê dayîn. Sala 1996’an ew deriyên kevîrî hatin dîtin û di sala 1999’an de jî şaredariya Mehabadê biryar da hemû



deriyên ji bo serdana torîst û serdankeran bikar bîne. Li gora ku saziya çandî ya şaredariya wî bajarî dibêje, her sal herî kêm 200 hezar torîst serdana şikeftê dikin.

Lê pîrsgirêka Seholanê, ne tenê ev e ku tê piştguhxiştin, lê belê ji ber ku rejîmê hin kelûpel bi simîta pêşesaziyê li wir çê kirine, hinek ji kaniyên wê şikeftê jî ziha bûne.

Şikefta Seholanê gelek dişubhe şikefta Elîsedr li Hemedanê. Cudahiyêke herî berçav di navbera wan du şikeftan de heye ew jî ev e ku qendîk angû kevîrên bûzê tevahiya derdora dîwaran û banê şikeftê di nav de nixumandiye. Ger pêçandina şikeftê bi bûzê nebûya, nava şikeftê ewqasî sar nedibû. Lê ev di demekê de ye ku heya niha tevahiya cihên şikefta Seholanê nehatine dîtin.

Piştî ku mirov derbasî nav şikeftê dibe û rîyeke kin bi piyan derbas dike, pişt re bi beleman dikare di ser avê re derbasî nav riyên cuda yên şikeftê bibe. Ji wan kevîran, mînakên ku dişubhin ajalan çê bûne. Piyê fîl, bûka deryayê û kevokên xweşik ji wan kevîran xuya ne. Weke ku mirov wan kevîran bi destên xwe çê bike, bedewî tede reng vedide. Di dîwarên şikeftê de ji xeynî nexş û nîgarên ajalan, hin nexş û nîgarên efsaneyî jî hene.

Kevokên taybet û perçemk angû şevşevok, take rûniştvanên şikeftê ne. Ew nolê mişkan in, lê perên wan hene û dikanin bifirin. Dema mirov bi beleman derbas dibe, ronahiya derdorê nahêle

perçemk li wir bimînin ji ber ku ew ji ronahiyê hez nakin û berên xwevdidin dalanên tarîtir. Ew di dalanan de ki ser hêkên xwe dirûnin. Lê kevokên xweşik jî di şikeftê de hene ku berdewam tînin û diçin.

Riya dervey şikeftê jî, ji bandora enerjîya nava şikeftê bêpar nemaye. Li gora yasayên Niyoton û fîzîkê, otombêl divê bi dijwarî bikarînin herin ser çiya. Lê li Seholanê ne fîzîk naskirî ye ne jî Niyoton. Ji ber ku otombêl bi hêsanî serdikeve û bi dijwarî vedigere quntara çiya. Çiya jî dikeve ser riya Burhanê ku weke navçeyeke xwedîya xwezayek xweşik naskirî ye.

Çalakvan dibêjin eger rejîm girîngiyê bide vê şikeftê û baş li ser dahata wê plan bike ku ji torîstan tê standin bê guman wê bajarên Mehabad û Bokanê jî avedaniyê bi xwe ve bibînin. Lê belê li wir, ji ber diziyê, ti berpirsekî rejîmê haya wî/wê ji Seholanê nîn e.

Ev çend sal in ku saziya Jîngeyê ya dewletê li parêzgeha Ormîyê biryara paraştina navçeyê daye. Lê li gor pêwîstiyê girîngî bi wir nehatuye dayîn. Bûdce jî ji aliyê wezareta navxwe ve radeştî qayinqametiya Mehabadê û saziya Jînge hatiye kirin lê ji ber sedemên nediyar ji bo vî karî nehatiye xerckirin. Tevî vê çalakvanên Mehabadî dibêjin diviyabû pereyên ku ji torîstan tîne standin, ji bo avedankirina navçeyê û pişxistinê bihata xerckirin. Lê ew jî xuya nîn e diçe kuderê!

Danûstandinên sar û sist ti nanî napêjin



N: Sabri Rasoul

Ewlehiya “bi darê zorê” ya li devera Kurdî “Cezîrê” nayê bi wê wateyê ku rewş ber bi aramiyê ve diçe, ji ber ku di rewşa niha de û ji ber nebûna tifaq û yekrêziya Kurdî, û rawestandina danûstandinên di navbera her du aliyên Kurdî de, û nebûna nîşan û fakterên serxistina wan û bidestxistina yekrêziya pêwîst, dibe ku dever careke din raştî êrîşên çekdarî bibe, ji ber ku têkîşandina “DAÎŞ” ya leşkerî li ser erdê nayê bi wateya têkbirina bîr û ramanên wê di xiyala xortên hatine xapandin, ku hîn jî ji aliyê derûnî “psîkolojî” amade ne li ser encamdana kiryarên herî tund û xwîn-rêj, nemaze di nav ciwanên Erebi de yên ku li ser xewn û xiyala dubarekirina serdema Xelîfe dijîn.

“Rêxistina DAÎŞ”, hîn jî “stok û embarek mirovî” ya mezin li ser kîl û jehra selefî û kafirkirinê heye, ku têkbirina yekcarî ya vê “stoka mirovî” ya hatiye paşguhxiştin, hevdem ji aliyê rejîmên şemkar û zordar ji bo her hewcedariyekî tene amadekirin, pêdivî bi tîkçûna wê li ser hemû astên: psîkolojî, rewşenbîr, siyasî, û hem jî leşkerî heye.

Her çende ku civînên nû di navbera ENK-S û Cîgirê nûnerê Amerîkî David Brownstein û HSD de, geşbînî û xweşiyek peya kir li ser heza Amerîkiyan li ser pêkanîna lihevkerin û rêk-kevtineke tevahî, lê hebûna Kadroyên PKK li herêma rojhilatê Firatê dibe astengî li pêş her firsendekê, ji ber ku li gorî dîtina ENK-S ku karûbarên leşkerî û îdarî ji hêla PKK ve tene bi rêvebirin, ku PYD bi tenê pergalek siyasî ye, herwiha ku pabend



nabe bi rêkvevtinên xwe bi her aliyekî Kurdî re, her wekî reva wê ya bilez û pênegirîya wê bi Peymana Duhok 2014 ya ku niha bûye “bingehê danûstandinan”.

Tiştê ku her firsendekê ji bo çekirina aramî û aştiyê tîk dibe, ew jî ku hercar bûyere çavnerêkirî diqewime, ku her tiştî wêran dike, û her tîgihiştinekî jinav dibe, wekî bûyera kuştina xortê kurd Emîn Îsa Elî birazayê serkirdeyên Kurd Bişar Emîn di bin îşkenceyê de di girtîgeheke PYD de, ku di 28ê hezîrana 2021 de malbata wî ji bo wergirtina termê wî hatibû agahdar kirin. Vê bûyerê reşatiya xwe avêt li rewşa Kurdî, ENK-S û PYD, dîsa deşt bi tawanbarkirina hev li ser bûyera kuştina bi êşkencê kirin, ku tawanek hovane ya siyasî ye, û dirindeyî û hovîtiya encamderên wê nîşan dide,

ku berpirsyartiya vê tawanê raşterast dikeve li ser stûyê “Rêveberiya Xweser” ji ber ku kuştin di zindanan wê û di bin kontrola wê û di çarçoveya berpirsiyariya wê ya yasayî de hate pêkanîn, ji ber berpirsariya wê wekî deştîlata “De facto” li hember “ewlehî û ewlehiya welatîyan”.

Wisa dixuye ku mercên siyasî xwe li ser kesayetiya mirovê Kurdî zal kiriye, ku di deştîpêkê de xwe li ser bîr û ramanên wê zal û kontrol kiriye wekî “Intellectual alienation”, ji ber vê yekê ku kesayetiya kurdî serbixweya xwe jidest daye û erkê bikaranîn bîr û ramanên xwe spartîye yê din, û di nav de jiyan û qeder û çarenivîsa welatê xwe spartîye bo kesekî din ku li şûna wî difikire, û bi navê wî biryaran distîne, û pêve wekî “dûvelanîk” hatiye girêdan, li ser perawîza jiyanê dijî û êdî bi kêrî

tiştêkî nayê.

Ev yek bi serê PYD hatiye, ji ber girêdana wê bi partiyek ji derveyî welêt, ku di her tiştî de di bin deştê wê de ye heta ji hêla leşkerî ve jî, ku vê Rêxistina Kurdî ti dengê xwe nemaye, û ti hewldanan nake jî ji bo rizgariya xwe ji kontrola hizrî “Intellectual alienation”.

Em dê çi hêviyan ji hemwelatîyekî ne azad û ne xwedan bîr û biryar bikin, dê wê çawa bibe alîkar ji bo danîna rênexşeya qedera xwe û çarenivîsa gelê xwe?

ENK-S, peymanek berfireh ya hevbeş dixweze di warên deştîlat, rêvebirin û berevaniyê de li ser bingehê Peymana Duhokê, û tîkiliyên xwe bi hêzên Kurdî re wekî rehend û kûrahiyek stratejî dibîne ne wekî dûvlankiya siyasî, hevdem ku “PYNK” bi serokatiya (PYD) jî xwe cuda ji PKK dibînin tevî girêdana wan bi wê re di mijarên tîkîlî û paraştin û ewlehiya navxweyî de.

Danûstandinên çavrêkirî yê werin wê gelekî tûj û dijwar bin, ji ber ku nakokî ji vîna siyasî ya her du alîyan kûrtir û bihêztir in, û ew nakokî dibin gef li ser binemayên tevna civakî û aştiya sivîl, û ji bo ku “Av vegere li ser coka xwe”, divê komîteyeke lêpîrsînê ya serbixwe û bêalî bi beşdariya nûnerên rêxistinên mafên mirovan were damezrandin, da ku tawanbaran êşkere bike, wan bi rêyên yasayî dadgeh û ceza bikin.



Çalakvanên medenî li navxweyê welat: “Zevî û xaniyên xwe nefiroşine bîhaniyan”

Çalakvanên medenî yên Kurd li navxweyê Rojhilatê Kurdistanê li dijî firotina zevî û xaniyan bi kesên bîhanî re kempeynêk lidar xistîne û ji xelkê parêzgeha Urmiyê û Sineyê daxwaz kirine ku zevî-yên xwe nefiroşine bîhaniyan.

Çalakvanên medenî yên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê kempeynêk lidar xistîne û dane zanîn: “Çima xelkê Kurd ji bo pareyeke zêde axa xwe difiroşin? Çima xelkê me bi tema`hkirin bi çend mily-onên zêde axa xwe difiroşine Tirkî?”

Herwisa wan çalakvanên medenî dane zanîn: “Çima di bajarên Kurdnîşîn de xelkê Kurd dibîne bi qiraxnîşîn, û xeyre Kurd li baştirîn cihên bajarên Kurdan de akincî dibin, û paşê jî wan dukan, xanî û zevîyan nafiroşine Kurdan!”

Ev dibêjin piraniya zevî û xaniyên xelkê Merîwan, Boka û Mihabad û gelek zevî-yên Sineyê ji aliyê Tirkî ve têne kirîn û li wan cihan



dukanan ava dikin û piştê jî heşîmeta wan di wan deveran de zêde dibe.”

Ev di berdewamiyê de dibêjin: “Di bajarên Qurwe û Bîcardê de heşîmeta Tirkî ber bi zêdebûnê ve diçe, çimkî Kurd zevîyên xwe difiroşine wan.”

Dukanên bajarê Baneyê ji aliyê Tirkî ve têne kirîn û kelûpelên Tirkî ji aliyê kolberan ve ku têne anîn û di wan dukanan de têne firotin.

Ev ji xelkê Kurdistanê daxwazê dikin ku zevî, dukan û xaniyên xwe nefiroşine xelkê biyanî û nemaze Tirkî û bila bifiroşine Kurdan. Û Ev di kempeyna xwe de dibêjin “Na bo firotina zevî û xanî...hwd bi xeyre Kurdan re”.

Bi vî awayî bi firotina zevî û dukanan demografiya bajarên Kurdistanê tê guherîn.

Kolberekî Kurd bi sedema berbûn ji bilindahiyên Hewramanê ve canê xwe ji dest da



Roja Înê 11`ê Pûşperê, kolberekî Kurd ê bi navê “Sadiq Nasirî” temen 50 salî xelkê gundê Sine û rûniştîyê bajarê Merîwanê, bi sedema berbûn li bilindahiya çiyayê “Te te” yê li Hewramanê canê xwe ji dest da.

Ew kolberê Kurd di dema veguhestin bo yek li navendên pizîşkî, bi sedema kurahiya birînan canê xwe ji dest da.

Li gorî amarên tomarkirî li Navenda Amar a Reksirava Mafê Mirov a Kurdpa yê, di heyama 6 mehên despêkî yên sala 2021`an ve bi gelemper 98 kolberên Kurd hatine kuştin û birîndarkirin.

Bo rizgarkirina çemê “Xuresû” ji çikbûnê 1,500 milyar Tumen hewce ye



Berpîrsê Giştî yê Jîngeha parêzgeha Kirmaşanê “Fereydûn Yawerî” tevî îşarekirin bi pîsbûna ava çemê “Xuresû”yê gotiye ku tevlibûna ava averoyên bajaran sedema serekî ya pîsbûna ava wî çemî ye û niha hezar û 500 milyar Tumen bo avakirina palavtingeh û pêşgirtin li tevlibûna ava averoyan hewce ye.

Berpîrsê Giştî yê jîngeha parêzgeha Kirmaşanê gotiye ku çavkaniya wî çemî “Serava Rewanser”ê ye û li nava bajarê Kirmaşanê diherike di halekê de ku dikarî bibe bi cihê geştiyariya wî bajarî

û bibe cihê jiyana avjiyan lê mixabin bûye çavkaniya pîsahiyê.”

Navbirî gotiye ku di niha de %65 averoyên bajarê Kirmaşanê tevî ava çemê “Xuresû”yê dibe.


Herwisa “Fereydûn Yawerî” gotiye ku baştirîn rê bo çareserkirina wê pirisgirêkê ew e ku palvtingehêkê din ava bikin û herwisa gotiye ku di niha de bi tenê %35 averoyên bajarê Kirmaşanê têne palavtin û bo palavtina %65 dinê dibe palavtingehêkê din bê avakirin.

Pirtûka “History Urmia” bi şêwe zaraveyê Kurmancî hate wergêrankirin û weşandin

Pirtûka “Kurtiyek ji dîroka Urmîyê” cara yekê bi şêwe zareveya Soranî hatiye çapkirin û nivîserê wê pirtûkê “Ferîd Letîfî” ye.

“Ferîd Letîfî” bi awayekî berfireh li ser parêzgeha Urmîyê lêkolîn kiriye.

Ev pirtûka ji aliyê “Keyhan Mihemedînîjad” ve bo ser zaraveyê Kurmancî bi şêweyê latînî hatiye wergêrandin û hevdem ji aliyê “Rehman Selîmî” ve jî



bo ser zimanê Farsî hatiye wergêrandin.

Dîroka Kurdistanê yek ji aloztirîn dîrokên ser zevî ye, ger em bixwazin ji wê dîrokê fam bikin û dîroka xwe nas bikin, divê em ji nû ve rûnên û bixwînin û binivîsin û çavkaniya wê aloziyê jî dizavire li ser dagîrkirina Kurdistanê.

Dîroka parêzgeha Urmîye û nemza bajarê Urmîye, Selmas, Xoy û Makû pir e ji komkujîkirina Kurdên wê beşa Kurdistanê ku li sedeyên cuda yên berê û paş Îslamê de hatiye kirin.

“Ferîd Letîfî” di nav pirtûkê de nivîsiye: “Di vir de heta ew cihê ku min karîbe bi wan komkujîyane û herwisa ew kiryarên ku di rastaya guherîna demografiya wê beşa Rojhilatê Kurdistanê de hatibe kirin, îşare pê kiriye.”

Cuma Ebdurehman Efrîn neterikand lê bi zehmetî di nav kavilan de dijî

Cuma Ebdurehman hunermendekî Efrînê ye ku tevî rewşa Efrînê ya piştî şer li wê herêma warê bav û bapîrên xwe maye û tevî ku di rewşeke pir zehmet û di nava xirbe û kavilan de dijî, hewl dide hunera resen a Kurdî ya taybet bi herêma Efrînê biparêze.

Li Herêma Efrînê ya Rojavayê Kurdistanê gellek dengbêj û hunermendên navdar hene. Lê rewşa xirab a Efrînê bandor li ser karên hunerî yên li Efrînê jî kiriye. Gellek hunermendên Kurd ji Efrînê derketine û gellek navendên Kurdan ên çand û hunerê hatine girtin. Hunermendên Kurd ên li Efrînê mane jî bi zor û zehmetiyeke zêde hewil didin ku karên xwe yên hunerî bikin.

Di bihara sala 2018an de di encama êrişa Tirkîyê û komên çekdar de, Herêma Efrînê ji kontrola hêzên Kurdî yên ser bi Rêveberiya Xweser a Rojavayê Kurdistanê derket û bi sedan hezar ji xelkê Efrînê dest ji war û milk û malê xwe berdan û ji tirsê komên çekdar û parastîna canê xwe û malabta xwe, koçber bûn.

Lê li gel wê yekê, hejmarek ji xelkê Efrînê li warê xwe man. Cuma Ebdurehman ku hunermendekî Efrînê ye, yek ji wan kesan e ku tevî şer û dagîrkeriya bi ser herêma wan de hatiye, Efrîn bi cih



nehiştiye û tevî hemû zor û zehmetiyan ew di nav kavlên bermahiya erîşên li ser efrînê de dijî.

Cuma Ebdurehman jî yek ji wan kesan e ku wî av ji kaniya hunera Efrînê vexwariye. Cuma Ebdurehman wiha xwe dide naskirin: “Navê min Cuma Ebdurehman e. Ez xelefê Adîkê me, Adîk Necar hunermend û dengbêjê menterqa Efrînê, Kurdaxayê bi rumet.”

Cuma Ebdurehman ku gellek caran bûye mêhvanê dîwanên qedirgîna, niha li ber deriyê xaniyê xwe yê bûye kavl û wêran disitire û behsa diwariya jiyana xwe û efrîniyan dike.

Ew hunermendê Efrînî behsa rewşa jiyana xwe li Efrînê dike û dibêje: “Malên min hatin topbarankirin. Em ji bombaranê rizgar bûn û em li cihê wisa dijîn. Jiyana me wisa ye, jiyana me gellek zehmet e. Ez hunera kalkên xwe dizanim û ez hûnera hunermend û dengbêjên devera Efrînê dizanim.”

Cuma Ebdurehman ne tenê stranên dibêje, lêbelê ew zêdetir weke hosteyê çêkirina Tembûran jî tê naskirin, di heman demê de tembûrên kevin û tîkçûuyî jî nûjen dike.

Têkildarî vî karê xwe, Cuma Ebdurehman wiha dibêje: “Ez Tembûran çêdikim û tembûrên kevin ez nû dikim. Dema tembûrek were ber destê min dixwaze bila deh parçe be, bi hişyarî li ser kar dikim û hemû parçeyên wê nû dikim û ez dikarim karê tîl û perdeyan jî bikim.”

Li gorî rapora Rêkxistina Mafên Mirov a Efrînê, piştî ku Efrîn kete bin destê hêzên Tirkîyê û çekdarên oposizyana Suriyê, tevî gellek sazî û dezgehan di heman demê de hejmareke navendên çand û hunerê yên Kurdan jî li herêmê hatine girtin. RÛDAW

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Amarê 6 mange ya kuştin û birîndarbûna kolberan di Kurdistanê de

Li gor amara navenda amarî ya Saziya Mafê Mirovî ya “Kurdpa”yê, di heyamê 6 mehên destpêka sala 2021’an de, bi giştî 98 kolberên Kurd hatine kuştin û birîndarkirin.

Kuştî: 25 kes

Birîndar: 73 kes

Awayê kuştî û birîndarbûna kolberan:

Teqeya rasteraşt ya hêzên leşkerî: 61 kes

Teqeya hêzên leşkerî yên Tirkîyê: 6 kes

Kevtina bin reniyê û mirina bi sedema sirê: 8 kes

kevtina ji bilindahiyên ve: 16 kes

Lêdan û îşkence ji aliyê hêzên leşkerî ve: 3 kes

Sekinîna dil di dema kolberiyê de: 2 kes

Teqîna mînê: 1 kes

Xendiqîn û kevtina nav çem, bi sedema lipeykevtina hêzên leşkerî: 1 kes

2 halet ji wê amarê, 2 birayên kolberên xelkê “Şemşîr” ê ser bi bajarê “Pawê” ne ku her di wê demê de 2 birayê din yên xelkê “Dişê” ê ser bi bajarê “Pawê”yê bi awayekî hevdem hatibûne birîndarkirin ku yek ji wan piştî çend rojan bi sedema dijiwariya birînen xwe canê xwe ji dest da.

Hin ji wan haletan bi sedema teqeya rasteraşt bi awayê regbarê bûye ku di encamê de kolber bi awayê desteyî hatine kuştin û birîndarkirin.

Amadekar: Evîn Mîstefazade

Sê girtî di girtîgeha navendî ya Urmiyê de hatine îdamkirin

Sibêdeha roja Yekşemî 13’ê Pûşper, sê girtiyên bi navên “Dawûd Qasimzade”, “Bihadîn Qasimzade”, kurên “Feysel”, xelkê gundê “Kormik” ê ser bi bajarê Selamasê û herwisa “Enver Ebdulahi”, xelkê bajarê Mihabadê di girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê de hatine îdamkirin.

Ew sê girtiye roja Şemî 12’ê Pûşperê, bona cîbicîkirina cezayên îdamkirinê bo odeya takekesiya bajarê Urmiyê hatibûne veguhastin.

Roja Derbasbûyî, Saziya Lêbûrîna Navnetewî daxwaza ragirtina îdama “Bihadîn Qasimzade” kiribû.

Saziya Lêbûrîna Navnetewî ragihandiye: “Bihadîn Qasimzade” li meha Sermaweza sala 1388’an hatiye binçavkirin û zêdetir ji 10 sale ku di sefa îdamkirinê de ye. Li gor wan zanyariyan ku ji aliyê çalakvanên mafê mirovî ve bi destê me gihîştîye, cezaya îdamkirin û cezadana navbirî di dadgeha nedadperwerane de li meha Cozerdana sala 1391’an, ji aliyê dadgeha cezadanê li bajarê Urmiyê bi ser wî de hatibû sepandin û li meha Rezbera sala 1392’an, ji aliyê dadgeha bilind a welat ve hatibû piştraştîkirin. Beşek ji sedemên cezadana navbirî “îtirafek”ê li xwe digre ku li gor gotinên “Bihadîn Qasimzade” ew îtirafe bi rêya îşkenceyê ve di girtîgeha polîsê agahiya bajarê Urmiyê de ji navbirî hatibû vergirtin.

Dawûd û Bihadîn Qasimzade, di rêkevtê 12’ê Sermaweza sala 1388’an de bi sedema kuştina du kesên di şerê malbatî de hatibûne binçavkirin.

Herwisa “Enver Ebdulahi” jî berê bi sedema tawana “kuştin”ê bi îdamê hatibû cezadan.



Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (401)

Temirandina agirê daristanên Zagirosê bi dema jîngehparêzan

